# BUROYA KURDÎ
# ya Pêwendî û Agahdariyê

**Bultena agahdariyê   N° 55  - Teşrîn 2009**
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles  -  Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be        kurdishbureau@scarlet.be

www.arsivakurdi.org

## XEBATA BUROYA KURDÎ

### *ÇIRÎ 2009*

**KONFÊRANS**

***04.10.2009 : Dîroka Kurdistanê (dûmahîk) – sedsala 19mîn***



Dîrokzan Wezîrê Eşo bûyerên girîng ên salên 40 ên sedsala 19mîn bi kurtî gortin. Piştî serhildana Mîr Muhammed di salên 20 e, desthilatên Tirkiya osmanî biryar stend ku dawiyê bibînin serhildanên dûhev ên mîrên kurd. Bi vî awayî, di salên 30 de, leşkerê osmanî êrîşeke mezzin, bi navê « Ji nuh de Dagîrkirina Kurdistanê », heta Kurdistan Îranê ya îro kir.

Li gel vê yekê, di salên 40 de, serhildaneke kurdî ya din, ji yên berê mezzintir, di bin serokatiya Mîr Bedir Xan ê Botan, bû. Ev mîr lihevkirinek bi çend mîr û begên kurd ên din re, bi navê « Yekîtiya Pîroz », wajo (imza) kir. Amanca wê rizgarkirina Kurdistanê û avakirina dewleteke kurdî ya serbixwe bû.

Mîr Bedir Xan pirr bihêz bû bû. Wî pere bi navê xwe da çêkirin. Li aliyekî wî « Mîrê Botan Bedir Xan » û li aliyê din jî mêjuya (tarîx) 1842 hati bû nivîsîn. Wî sîronên mîrîtiya xwe heta Kurdistana Îranê ya îro fireh kirin, bajarê Cizîrê paytexta dewleta kurdî îlan kir û ala kurdî bilind kir.

Lê di behara 1847 de, hukûmeta Istanbûlê dest bi qonaxa (merhele) 2mîn a « Ji nuh de Dagîrkirina Kudistanê » kir. Ew bi alîkariya Yezdan Şîr, ku xiyaneta pismamê xwe Mîr Bedir Xan kir, mumkun bû. Leşkerê tirkî serhildana kurdî  bi hovî  pelixand. Wî talan kir û bi hezaran sîvîlan qir kirin. Mîr Bedir Xan hat girtin û sirgûn kirin girava (cezîre, ada) Krêtê, li Yûnanistanê. Piştre, ew li Şamê, li Sûriyê, hat gor kirin. Gora wî, û ya neviyê wî Celadet Bedir Xan, heta îro li wê derê ne.

**ROJA DYALOGÊ**



***17.10.2009 :*** Cara sêyemîn, rêxistina « Foyer », bi hevkariya gelek rêxistinên din, ku ji wan Buroya Kurdî, roja dyaloga pirçandî pêk anî. Li 5 şaredariyên Bruksêlê, 8 maseyên dyalogê, ku her yek ji wan nêzîkî 10 kesên ji netewahiyên cihê civandin, hatin vekirin. Babeta îsal « Bi yê din re peyivîn » bû. Li Buroya Kurdî, Ylva Berg, berpirsiyara Bruksêlê ya koordinasyona derhatiyan, « Internationaal Comité », maseya dyalogê bi rê ve bir. Bi ser de jî, Buroya Kurdî nêzîkî 10 kesên kurd û beljîkî şandin maseyên din. Li dawiya rojê, hemî beşdar li ser du keştiyên Kanala Bruksêlê şahî kir.

# NÛÇE JI KURDISTANÊ

## *ÇIRÎ 2009*

## KURDISTANA TRIKIYÊ

### 3 ÇALAKVANÊN KURD TÊN TAWANBAR KIRIN

***Di 05 Çirî 2009 de***, parêzer (avukat) û çalakvana mafên mirov, Eren Keskin ; lîzvan Murat Batgı û nivîskar Edip Polat salek cezayê girtinê ji aliyê Dadgeha Bilind a Tawanan a Diyarbekirê stend, ji bo *« propaganda kîn û dijminayiyê »*. Ev yek, ji bo ku wan di 31 Adar 2006 de, di axaftinên xwe li 6[min] Fêstivala Hunder û Çandê ya Diyarbekirê de, gotinên “Kurdistan” û « Kurd » bi kar anî bûn.

Dadgehê biryar jî stend ku wan ji karên fermî bêpar (mehrûm) bike û beşdarbûna hilbijartinan û birêvebirina rêxistin û partiyên siyasî ji wan re qedexe bike.

Ev tawanbarkirin nîşan dide ku « Vebûna Kurdî » hîn dest pê ne kiriye !
*(rudaw.net ; bianet, 05.10.2009)*

### PROTOKOLA TIRKIYE-ERMENISTANÊ LI ZURICHê

***Di 10 Çirî 2009 de***, wezîrê tirk ê karên derve, Ahmet Davutoğlu, û hevkarê wî yê ermenî, Edvard Nalbatyan, li Zurichê, li Swîsrê, protokolek li ser vekirina sîronê her du welatan û hevkariya di warên ramyarî (siyasî), aborî, ênêrjiyê … de wajo (imza) kir. Ev yek bi amadebûna wezîra amerîkî ya karên derve, Hilary Clinton ; hevkarên wê yên rûs, Segey Lavrov, û fransî, Bernard Kouchner ; serokê Konseya Ewropî, Samuel Zbogar û Nimînendeyê Bilind ê Yekîtiya Ewropa, Xavier Solana.

Ev wajokirin bitenê piştî 3 katjmêr (saet) boran (krîz) li ser pirsa Karabaxê, navçeyeke ermenî li nav Azerbaycanê, ku ji aliyê Ermenistanê hatiye dagîr kirin, bû. Li Ermenistanê, bi hezaran kes xwe pêşan da (meşiyan), ji bo riswakirina (protêsto) vê wajokirinê û ji Tirkiyê xwestina naskirina nijadkujiya ermenî.
*(netkurd.com, Tvyên cihê, 10.10.2009)*

### RAPPORA KOMMISYONA EWROPÎ

***Di 14 Çirî 2009 de***, Kommisyona Ewropî rapporek bi navê “Turkey 2009 Progress Report” (Rappora 2009 li ser Pêşveçûna Tirkiyê) weşand. Li dawiya rapporê ragihandineke Kommisyonê ji Parlement û Konseya Ewropî re heye. Ew ji aliyê Kommiserê Firehkirinê, Olli Rehn, hatiye amade kirin.

Rappor amaje dike (işaret) pirsa kurdî, pirsa Qibrisê, pêwendiyên bi Ermenistanê re, zagona (qanûn) tirkî û azadiya ravekirinê. Rexneyên wê ji yên rapporên berê kêmtir in. Berpirsiyarên tirk jê dilxweş in. Olli Rehn daxuyand ku Kommisyon piştgiriya pêvajoya (processus) çarekirina pirsa kurdî û peymana bi Ermenistanê re dike.
*(netkurd.com, azady.nl, mediakurd.com, 14.10.2009)*

### ÖCALAN JI 3 KOMÊN PKKÊ DIXWAZE KU VEGERIN



***Di 14 Çirî 2009 de***, serokê PKKê ku li zîndanê ye, Abdullah Öcalan, xwest ku Komên Aşîtiyê yên PKKê ji Kurdistana Iraqê û Ewropa vegerin Tirkiyê ji bo giftûbêjkirina pirsa kurdî. Û wî ji hemî rêxistinên civaka sîvîl û partiyên siyasî xwest ku piştgiriya vê înîsyatîvê bikin.



www.arsivakurdi.org

PKKê pejirand (qebûl kir) ku sê koman bişîne Tirkiyê. Du ji wan ji Kurdistana Iraqê (Çiyayê Qendîlê û deşta Mexmûrê) û yek jî ji Ewropa.

Di 1999 de, dema ku Öcalan hati bû ragirtin, wî heman (eynî) tişt ji PKKê xwesti bû. Hemî kesên ku xwe teslîm kir hatin girtin !
*(netkurd.com, avestakurd.net, pukmedia.com, rizgari.org, rudaw.net, 15 û 16.10.2009)*

***Di 19 Çirî de***, 34 kes bi navê « Koma Aşîtiyê » ji deşta Mexmûrê û çiyayê Qendîlê, ji Kurdistana Iraqê, çûn deriyê gumrukî yê Xabûr/Ibrahîm Xelîl. Piştî jêpirsînan ji aliyê dadmendekî (hakim), 29 ji wan û piştre 5ên mayîn, hatin berdan.

Piraniya van kesan beşdar ne bû bûn tevgerên leşkerî. 26, ku ji wan 9 jin û 6 zarok, li deşta Mexmûrê dijiyan. 8ên din, ku ji wan 4 jin û 4 mêr, ji çiyayê Qendîlê hatin.

Dema ku hatin azad kirin, endamên vê komê li otobuseke partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, siwar bûn û ji aliyê gelheyeke mezzin hatin pêşwazî kirin. Piştre, ew çûn Diyarbekirê û li wê derê pêşwaziyeke mezzinter ji wan re hat kirin, axaftin û stran hatin gotin. Siaysiyên tirk û mêdyayên tirkî ji van xwepêşandanan gelek dilteng (aciz) bûn û dozkarê (procureur) Dadgeha Bilind dest bi vekolînekê (ankêt) li ser awayê vê pêşwaziyê kir. Konsulxaneyên tirkî li Ewropa vîza ne dan endamên koma ku ewê ji Ewropa vegeriya.
*(Çapemeniya kurdî, tirkî û erebî, 19 – 22.10.2009)*

Li ser awayê ewqas bideng ê vegera van koman, serokewezîrê Kurdistana Iraqê, Nêçîrvan Berzanî, bersîv dan Rûdawê û got ku divê ku PKK xwe ji avêtina gavên provokatîf dûr bixe. Li gora wî, baş e ku ev kom bên şandin, ji bo nermkirina hewayî li ser pirsa kurdî li Tirkiyê, lê ku ev awayê qurre dijminayiya nijadparêzên tirk li hemberî Kurdan tûj dike. Serokê Kurdistana Iraqê, Mesûd Berzanî, jî daxuyand ku divê ku PKK xwe biguherîne, eger neke ewê gel pişta xwe bide wê.
*(rudaw.net, peyamner.com, pukmedia.com, netkurd.com, rizgari.org, azady.nl, mediakurd.com, 26 – 31.10.2009)*

**BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ**
***Di 13 û 14 Çirî 2009 de***, piştî du meh rawestan, firokeyên tirkî ji nuh de navçeya sînorî ya Amedî, li Kurdistana Iraqê, bombe kir.

Berpirsiyarê hêzên parastina sînorên parêzgeha Duhokê, Efser Huseyn Temer, daxuyand ku gundên Nêrwe û Rêkanê, yên qezayê Dêrelukê, hatin bombe kirin. Bi ser de jî topxaneya tirkî gundên Sernê, Hûre û wekî din, ên heman navçê, bombe kirin. Wî bi ser de jî got ku ev gund ji berê vala bûn û ku bitenê zararên maddî bûn.

Ev bombekirin di heman roja seredana serokwezîrê tirk Recep Tayyıp Erdoğan Bexdanê bûn !
*(rudaw.net, 15.10.2009)*

**KONSULXANEYA TIRKÎ LI ALMANYA PASAPORT NADE ZAROKEKÎ KURD JI SEDEMA NAVÊ WÎ**
***Di Çirî 2009 de***, konsulxana tirkî li Almanya ne pejirand (qebûl ne kir) ku pasaporteke tirkî bide zarokekî kurd ê du salî ji sedema navê wî yê kurdî !
*(azady.nl, Ekurd, 23.10.2009)*

**PARÊZERÊ ABDULLAH ÖCALAN TÊ TAWANBAR KIRIN**
***Di Çirî 2009 de***, dadgeha cezayî ya Riha (Urfa) Muzaffer Demir, yek ji parêzerên (avukat) serokê PKKê, Abdullah Öcalan, bi 3 sal û 6 meh girtin tawanbar kir, ji bo ku wî di xwepêşandaneke (meşîn) riswakirina (protêsto) girtina wî û ya tevgerên leşkerî li Kurdistana Iraqê de goti bû « Mîrza Öcalan ».

Ev biryara dadgehê piştî 3 dozên (da'wa) ku li dijî vî parêzerî hati bûn vekirin hat stendin.
*(netkurd.com, 23.10.2009)*

**PALEMENTEREKE KURD TÊ TAWANBAR KIRIN**
***Di 26 Çirî 2009 de***, dadgeha 4mîn a cezayên giran a Diyarbekirê parlementera kurd Aysel Tuğluk, ji partiya DTPê, bi salek û 6 meh zîndan tawanbar (mehkûm) kir. Ev yek ji sedema axaftineke wê li Diyarbekirê di 2006 de, ku weka propaganda ji bo PKKê tê dîtin.
*(avestakurd.net, pukmedia.com, 27.10.2009)*

# KURDISTANA IRAQÊ

**KURDEK LI PAKISTANÊ TÊ KUŞTIN**
***Di 05 Çirî 2009 de***, endazekî (muhendis) kurd ê Iraqê, Botan Ahmad, tevî sê hevalên xwe, di êrîşeke xwekuj de li paytexta Pakistanê hat kuştin.

Botan Ahmad ji 13 salan de ji bo WFP "UN World Food Program" (Bernama Cihanî ya Xwarinê ya UNê) kar dikir. Ew ji aliyê UNê hati bû şandin Pakistanê ji bo ku belavkirina xwarin li ser penaberên pakistanî ku ji



www.arsivakurd.org

şerrê di navbera Taliban û leşkerê pakistanî de reviyane bi rê ve bibe.
Botan bawername (diplôme) ji Kollêja Endaziyê stendi bû, zanebûna wî ya fireh di warê têknolojî û agahdariyê de hebû û sê “degrees” yên Microsoft, ên Bill Gates, stendi bûn. Ew 31 salî û bavê 3 zarokan bû.
(rudaw.net, pukmedia.com, 12.10.2009)

**KONSULXANEYEKE HOLLANDÎ LI KURDISTANÊ**

***Di 12 Çirî 2009 de***, konsulxaneya hollandî li Hewlêrê, bi amadebûna serokê Parlementa Kurdistana Iraqê, Dr. Kemal Kerkûkî; balyozê (sefîr) Hollanda li Bexdanê, Peter Van Leon, û kesahiyên din ên ramyarî, hat vekirin. Di axaftina xwe de, balyozê hollandî got ku ew ji pêşveçûna Kurdistanê dilxweş e û di warê pêwendiyên wêbê yên vê herêmê bi Hollanda re geşbîn e. Li dawiya merasîmê, alên Kurdistan, Hollanda û Yekîtiya Ewropa hatin bilind kirin.
(pukmedia.com, rudaw.net, peyamner.com, avestakurd.net, 12.10.2009)

**PÊŞANGEHA 5mîn A BAZARGANIYÎ YA NAVNETEWEYÎ**

***Di 12 Çirî 2009 de***, serokwezîrê Kurdistanê, Nêçîrvan Berzanî, li Hewlêrê Pêşangeha 5mîn a Bazarganiyî ya Navneteweyî, bi amadebûna kesahiyên ramyarî yên Kurdistan û Bexdadê, û karmendên neteweyî û navneteweyî, vekir.
750 şirket, ji 29 welatên Rojhilata Navîn, Ewropa û Amerîka, beşdarî wê bûn. Ewê pêşangeh heta 15 Çirî bajo.
(pukmedia.com, avestakurd.net, 12.10.2009)

**ÊRÎŞ LI SER NAVÇEYÊN KURDÎ YÊN EREBKIRÎ**

***Di 15 Çirî 2009 de***, bombeyek li ser karwaneke polîs, li nêzîkî taxa pîşesaziyî (sinaî) ya Kerkûkê, teqiya. 4 polîs birîndar bûn.

**11 BALYOZÊN KURD JI 53**

Serokê Iraqê, Celal Talabanî, lîsta balyozên (sefîr) iraqî stend. Tê de 53 balyoz, ku ji wan 11 kurd in, hene.
(avestakurd.net, 16.11.2009)

**PÊŞANGEHEKE ÇANDINÎ LI LONDONê**

***Di 19 Çirî 2009 de***, şandeke cotkarên Kurdistana Iraqê, bi serokatiya danişmendê wezareta çandinê (ziraet), Enwer Abdullah, beşdar bû pêşangeheke çandinî (ziraî) ya naveneteweyî li navenda EXCELê, li Londonê. Amanca vê beşdarbûnê pêşandana berhemên çandinî yên Kurdistanê û hînbûna ji ezmûnên (tecrube) welatên pêşketî di vî warî de bû. Ewê pêşangeh du rojan bajo.
(avestakurd.net, 19.10.2009)

**JI MILYONEK TÛRÎST BÊTIR LI KURDISTANÊ**

***Di Çirî 2009 de***, birêvebirê plankirinê yê wezareta tûrîsmê ya Kurdistana Iraqê, Wefa Cebbar, ji Aknews re daxuyand ku di 18 mehên dawîn de ji milyonek tûrîst bêtir seredana Kurdistanê kir. Piraniya wan Erebên Navend û Başûrê Iraqê ne. Tûrîstên ji Îranê û jimareke piçûk ji Ewropî û Amerîkiyan jî heye.
(aknews.com, rizgari.org, 23.10.2009)

**97.000 MALBATÊN KURD JI KERKÛKÊ HATINE QEWIRANDIN**

***Di 25 Çirî 2009 de***, parlementerê kurd Sadî Berzencî, endamê Hevalbendiya Kurdistanî li parlementa fêdêral a iraqî li Bexdadê, di konfêranseke çapemeniyê de got ku di 30 salên dawîn de ji 97.000 malbatên kurd bêtir ji Kerkûkê hatine qewirandin. Û wî got jî ku hin kes dixwazin ku Kerkûkê ji hilbijartinên parêzgehî yên iraqî ku ewê di 16 Çile 2010 de bibin dûr bixin, lê ku helwesta wan ji aliyê Dadgeha Destûrî hatiye avêtin (red kirin).
(aknews.com, peyamner.com, netkurd.com, 26.10.2009)

**GIHANDINA 40 HUQÛQZANAN**

***Di 29 Çirî 2009 de***, rêxistina almanî AGEFê “atelier”yeke gihandina 40 huqûqzanan, ku ji wan dadmend (hakim), birêvebirên giştî û parlementer, kutah kir (qedand). Ew li Hewlêrê bi alîkariya konsulxana almanî û wezareta dadiyê ya Kurdistana Iraqê hat pêk anîn.
Ev “atelier” 20 roj ajot. Tê de beşdaran guhdariya konfêransan kir û fêr ji aliyê pispor û dadmendên alman stendin. amanca wê bilindkirina asta (sewiye) huqûqzanan û pêşdebirina dadiyê li Kudistanê bû.
(peyamner.com, 30.10.2009)

**WEZÎRÊ TIRK Ê KARÊN DERVE LI KURDISTANÊ**




***Di 30 Çirî 2009 de***, wezîrê tirk ê karên derve, Ahmet Davutoğlu, bi hogiriya wezîrê dewletê yê tirk, Zafer Çağlayan, û şandeke mezzin a karmendan, çû Kurdistana Iraqê. Ew tê de ji aliyê serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, hat pêşwazî kirin. Piştre, konfêranseke

www.arsivakurdi.org

çapemeniyê ya hevrayî, bi amadebûna serokwezîrê kurd ê nuh, Dr. Behrem Salih; wezîrê karên derve yê Iraqê, Huşyar Zîbarî; serokê parlementa Kurdistana Iraqê, Dr. Kemal Kerkûkî; serokwezîrê berê Nêçîrvan Berzanî, û kesahiyên din, hat pêk anîn.

Her du alî daxuyand ku ewê konsulxaneyeke tirkî li Kurdistana Iraqê bê vekirin û ku ewê pêwendiyên aborî û bazarganiyî bên xurttir kirin.
*(Çapemeniya kurdî, tirkî û erebî, 31.10.2009)*

# KURDISTANA ÎRANÊ

**GUHERANDINA ENDÎŞEDAR YA CIYÊN GIRTIYÊN RAMYARÎ YÊN KURD**
Pêla guherandina illêgal a ciyên girtiyên ramyarî (siyasî) yên kurd ji zîndana Sinê, li Kurdistana Îranê, ber bi zîndanên bajarên din ên Îranê, ber bi bilindbûnê diçe :

***Li dawiya Îlon 2009***, 3 girtiyên zîndana Sinê, Şêrko Moarefî, Habîbollah Latîfî û Êhsan Fattahyan, hatin xistin nav hucreyên tenha. Her sê hukmê îdamê stendiye.

***Di 03 Çirî de***, du girtiyên Sinê, Javad Alîzade û Kaveh Javanmard, hatin birin zîndana navendî ya Hamadanê, bê tu fermaneke dadgehî.

***Di 04 Çirî de***, Fardîn Xoramî hat birin zîndana Xoram-Abad. Ew di 2006 de hati bû ragirtin û tawanbar kirin.
*(hra-iran.org, 04.10.2009)*

**RAGIRTIN Û HUNDABÛNÊN KURDAN LI MAHABADÊ**
***Di 01 Çirî 2009 de***, li gora Komita Kurdistanê ya Çalakvanên Mafên Mirov li Îranê, Karîm Sofî Molûdî, serokê Sendîka Bajarên Pîşesaziyî (sinaî) li Mahabadê, û Teir Faramarzî, Kurdekî din ji Mahabadê, hatin ragirtin û şandin ciyekî nenas. Sedemên ragirtina wan ne zelal in. Ji berê jî, di havîna buhurî de, ew di mangirtina (grêv) bazarganên Mahabadê de hati bûn girtin.

***Di 01 Çirî de jî***, du jin, Şîrîn Ahmadî, 22 salî, û Kajal Şêx Mohammadî, ku li Mahabadê dimînin, ji aliyê hêzên ewlehiyê ji hev cihê hatin ragirtin û birin ciyên nenas.
*(hra-iran.org, 05.10.2009)*

***Di 04 Çirî de***, jin û mêrek, Azîz Abdollahî û Leyla Xarazyan, ji sedemên nenas hatin ragirtin. Abdollahî ji kunêreke mejiyî dêşe û Xarazyan jî nuh zarok aniye.

Rûniştevaneke din a Mahabadê, Nasrîn Rûrast, ji aliyê buroya servîsên dizzî hat bang kirin, lê ne çû. Ew careke din hat bang kirin û tirsandin (tehdîd kirin).
*(hra-iran.org, 09.10.2009)*

**GIRTIYEKÎ KURD MIR**
***Di 03 Çirî 2009 de***, li gora Komita Girtiyên Çalakvanên Mafên Mirov li Îranê, girtiyekî kurd, Amîr Abdollahnejad, ku li zîndana navendî ya Urmiyê hati bû girtin, piştî lêdanên xurt ji aliyê çend efserên zîndanê, li bin fermana û bi amadebûna Akbar Pişehvar, li girtîgehê mir. Birînên wî ewqas giran bûn ku ew dereng hat birin nexweşxana zîndanê. Lê yaneyeke (êkîp) bijîjkî (tibbî) got ku ew nikare tutiştî bike ji bo ku jiyana wî kutah (xelas) bike. Malbata wî laşê wî xwest û gilî kir.
*(hra-iran.org, 05.10.2009)*

**58 KURDÊN SÎVÎL TÊN KUŞTIN Û 76 TÊN RAGIRTIN**
Li gora Rêxistina Çalakvanên Mirov, di havîna buhurî de 58 sîvîlên kurd di bombekirinên gundên xwe de, ji aliyê leşkerê îranî ku şerrê PJAKê (şaxa îranî ya PKKê) dike, hatin kuştin û bi dehan jî birîndar bûn.

Rêxistin dibêje jî ku di sê mehên dawîn de, 76 çalakvanên sîvîl ên kurd hatin ragirtin û ku 14 ji wan bi hukmê îdamê hatin tawanbar kirin.
*(rudaw.net, 07.10.2009)*

**KAMPANYA JINÊN KURD**
Rêxistina jinên Kurdistanê, Azarmehr, kampanyake li dijî bilindbûna ragirtin, tawanbarkirin û kuştinên li Kurdistana Îranê, nemaze li Sinê, ajot. Ev yek bi alîkariya dê, xuşk û jinên girtiyên ramyarî (siyasî), û rêxistinên din.
*(azady.nl, 09.10.2009)*

**KUŞTINA DU GIRTIYÊN KURD**
Du girtiyên kurd, Ahmad Mohammadî û Namir Abdullahpûr, li Kirmanşah û Urmiyê hatin kuştin.
*(azady.nl, NCR-Iran, 13.10.2009)*

**ÊRÎŞ LI DIJÎ PASDARAN**
***Di 18 Çirî 2009 de***, cara yekemîn li Îranê, êrîşeke xwekuj li dijî polîsê îranî « Pasdar » 29 kes kuştin û 28 jî, ku ji wan berpirsiyarên bilind, birîndar kirin.

Li gora BBC, ku bi zimanê erebî diweşîne, ev êrîş li bajarê Bîşînê, li parêzgeha Sîstan/Baluçistanê, li Başûrê-Rojhilata Îranê, li nêzîkî sînorê pakistanî, bû.

www.arsivakurd.org

Pasdaran bi pêkanîna civîneke di navbera şîî û sunniyan de (Belûç sunnî ne) xerîk (mijûl) bûn. Çapemeniya fermî ya îranî got ku êrîş ji aliyê rêxistina belûçî ya sunnî Cundullah hat kirin. Serokê îranî pê Amerîka û Ingiltere tawanbar kirin !
*(peyamner.com, kurdistan-news.net, 18.10.2009 ; rudaw.net, 19.10.2009)*

**SÊ KURD TÊN RAGIRTIN**
***Di 23 Çirî 2009 de***, Badî Hoseyn Panahî, Kurdek ji bajarê Garvehê, ji aliyê servîsên dizzî yên îranî hat ragirtin û birin ciyekî nenas. Komita Kurdistanê ya Rêxistina Mafên Mirov (HRA) daxuyand ku tu sedemeke vê ragirtinê nîn bû. Badî Hoseyn endamê malbata Anvar Hoseyn Panahî, girtiyekî ramyarî yê kurd ku bi hukmê îdamê hatiye tawanbar kirin, û ya birayê evê dawîn, Afşîn Hoseyn Panahî, ku berê çend rojan hati bû ragirtin ji bo ku wî di lêgerîna doza birayê xwe yê girtî de israr dikir e.

***Di 28 Çirî de***, hêzên polîs ketin gundê Vale Zahirê, li nêzîkî Merîwanê, xanî çavdêrî (kontrol) kirin û du rûniştevanên wan, Baset û Şivan, bi lêdan ragirtin. Tu agahdarî li ser sedemên van ragirtinan nîn e.
*(hra-iran.org, 29.10.2009)*

**SÊ KURD TÊN KUŞTIN**
***Di Çirî 2009 de***, Komita Kurdistanê ya Rêxistina Mafên Mirov (HRA) daxuyand ku endamên servîsên dizzî yên îranî agir berda erebeyekê li Mavanehê, li nêzîkî Urmiyê, û her sê kesên ku tê de bûn kuştin. Piştre, van polîsan daxuyand ku du ji van kesan endamên partiyeke dijberiyê (muxalefet) bûn. Laşên wan ne hatin dayîn malbatên wan.
*(hra-iran.org, 27.10.2009)*

## KURDISTANA SÛRIYÊ

**HEFT HUNDERMENDÊN KURD TÊN RAGIRTIN**
***Di 03 Çirî 2009 de***, ji sedema straneke neteweyî ya kurdî ku li dawiya şahiyekê (dawet) hat stiran, stranbêj Cemal Sa'dûn, stranbêja jin Nûhad Yûsiv, her du muzîsyenên wan (org), Ciwan û Dijwar, fotokêş Zahid, birayê zava û xwediyê destûra berhemanînê, Hozan Muhammed Seîd, û xwediyê eywaneke konsêran, Abdullatîf Mekî, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Dêrikê hatin ragirtin û birin zîndana Hesîçê. Zava li Almanya dijî û ji bo jinanînê çû bû Dêrikê.

Li Kurdistana Sûriyê, eger meriv bixwaze ku konsêrekê pêk bîne, divê ku berê destûr ji ewlehiya ramyarî (emnê siyasî) bistîne. Bi ser de jî, hunermend divên ku daxuyaniyekê wajo (imza) bikin ku ewê stranên neteweyî yên kurdî nestirên.
*(amude.com, 06.10.2009; rudaw.net, 07.10.2009)*

**CARDIN SÊ SERBAZÊN KURD TÊN KUŞTIN**
***Di 09 Çirî 2009 de***, cardin serbazekî (esker) kurd, Firas Bedrî Hebîb, ji navçeya Efrînê, di dema xizmeta leşkerî de hat kuştin. Desthilatên leşkerî ew gelek zû di 11 Çirî de gor kir û ji malbata wî re daxuyand ku ew di qezayekî rê de mir ! Jê re sê meh ma bû ku xizmeta leşkerî kutah bike (biqedîne).
*(avestakurd.net rudaw.net, 16.10.2009)*

***Di 11 Çirî de***, li gora Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê (MAF), serbazekî din, Rêzan Abdulkerîm Mêran, ji navçeya Dêrikê, hat kuştin. Berpirsiyarên leşkerî daxuyand ku ew di qezayekî erebê de mir !

Bi ser de jî, Sadiq Huseyn Mûsa, ji navçeya Efrînê, hat kuştin. Li gora MAFê, ji dema serhildana kurdî ya 2004 heta nuha 32 serbazên kurd ên cuhan hatine kuştin.
*(avestakurd.net, 19.10.2009)*

**BERPIRSIYAREKÎ RAMYARÎ YÊ KURD TÊ TAWANBAR KIRIN**
***Di Çirî 2009 de***, dadmendê (hakim) leşkerî yê Qamişlî endamekî polîtburoya partiya kurdî Yekîtî, Ibrahîm Biro bi 8 meh zîndan tawanbar kir. Li ser bingeha bend 288 a zagona (qanûn) sûrî, Biro bi endambûna partiyeke ramyarî (siyasî) ya dizzî hatiye tawanbar kirin.

Ibrahîm Biro di 29.04.2009 ji aliyê servîsên dizzî yên sûrî hati bû ragirtin û piştre xistin zîndanê.
*(avestakurd.net, 21.10.2009)*

**MALBATEKE KURD YA ALMANYA LI SÛRIYÊ TÊ RAGIRTIN**
***Di Çirî 2009 de***, Rêxistina Almanî ya Parastina Gelên Bindest, GfbV, daxuyand ku malbata Cindo, ku ji almanya hati bû vegerandin, li Sûriyê hat ragirtin.

Ev malbata kurd a yezîdî, ku ji dê "Şêxa Cindo" û 4 zarokên wê pêk bûye, di 2001 de ji Sûriyê derketi bû û li Almanya mafê penaberiyê xwesti bû. Di 08 Çile 2009 de, daxwaziya wê hat avêtin (red kirin) û ew hat vegerandin Sûriyê. Li firokexana Şamê, hemî endamên malbatê hatin ragirtin û heta nuha tu nûçe ji wan nîn e.
*(pukmedia.com, avestakurd.net, 24.10.2009)*

www.arsivakurdi.org

**RONAKBÎREKÎ KURD TÊ RAGIRTIN**

***Di 20 Çirî 2009 de***, Behcet Muhammed Elî Ibrahîm Begê, kesahiyeke (şexsiyyet) civakî û ronakbîrek, li mala xwe, li Amûdê, hat ragirtin. Li gora Partiya Yekîtiya Kurdî ya Dêmokrat a Sûriyê, ew di heman (eynî) rojê de hat birin şaxa ewlehiya bajarê Hesîçê. Heta nuha tu nûçe jê nîn e. Ew 51 salî ye û bavê 6 zarokan e.
*(avestakurd.net, amude.com, 25.10.2009)*

# NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

**FÎLMEKE KURDÎ XELAT LI ALMANYA DISTÎNE**

***Di Çirî 2009 de***, li Fêstivala Navneteweyî ya Fîlmê ya 17mîn li Hamburgê, Xelata « Young Talent » (Talenta « mewhibe » Cuhan) ji fîlmçêkerê kurd Miraz Bezar re, ji bo fîlma wî « Min Dît », hat dayîn. Fîlm çîroka du zarokên Diyarbekirê ku dê û bavê wan ji aliyê kontr-gêrilla hatine kuştin dibêje.

***Di Îlon 2009 de***, vê fîlmê Xelata « Gaztea Award » li Fêstivala San Sebastian, li Welatê Baskî, li Ispanya stendi bû (li bultena me ya buhurî binêre).
*(netkurd.com, avestakurd.net, 04.10.2009 ; azady.nl, 07.10.2009)*

**BANÛ DANIELLE MITTERRAND LI KURDISTANÊ**



***Di 05 Çirî 2009 de***, Banû Danielle Mitterrand, xanima serokê berê yê Fransa, François Mitterrand, li Hewlêrê « Dibistana Navneteweyî ya Danielle Mitterrand“, bi amadebûna wezîrê kurd ê perwerdê, Dilşad Abdulrahman, û konsulên Fransa û Almanya, vekir. Di vê dibistanê de hemî pol (sinif), ji dayikî heta dawîn, hene û perwerde bi kurdî, ingilîzî, fransî û erebî tê kirin.
*(rudaw.net, peyamner.com, pukmedia.com, avestakurd.net, 05.10.2009)*

***Di 09 Çirî de***, Banû Mitterrand dibistaneke weha jî li Suleymaniyê, bi amadebûna Banû Hêro Ibrahîm Ehmed, xanima serokê Iraqê, Celal Talabanî, û birêvebirê giştî yê perwerdê li Suleymaniyê, vekir.
*(avestakurd.net, 09.10.2009)*

Banû Mitterrand rastî serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, hat û axaftineke piştgiriyê bi Kurdan re li Parlementa Kurdistanê kir.
*(TV û malperên kurdî)*

**SEROKÊ ALMANYA XELAT DIDE KURDEKÎ**

***Di 05 Çirî 2009 de***, li saraya serokatiya almanî « Schloss Bellevue », li Berlînê, merasîma dayîna xelatan ji 41 kesahiyên ku di warên cihê de çalak in bû.

Ji van kesahiyên xelatkirî, Kurdekî Tirkiyê, Mehmet Tanrıverdi, serokê BAGIV (Yekîtiya Fêdêral a Rêxistinên Penaberan), bû. Xelat jê re ji aliyê serokê alman Kohler hat dayîn.
*(netkurd.com, 06.10.2009)*

**JINEKE KURD ENDAMA RÊXISTINEKE SWÊDÎ**

***Di Çirî 2009 de***, rêxistina swêdî « Studieförbundet Vuxenskolan", ku perwerdê han dide (teşwîq dike), Bêrîvan Muhammed, Kurdeke Sûriyê ya 26 salî, weka endama heyeta idarî hilbijart. Ew tenê endama ne swêdî ya vê heyetê ye.

Bêrîvan Muhammed rojnamevan, çalakvan û endama partiya swêdî ya çep û ya encumena şaredariya bajarê Sundesvallê ye.

**PÊŞANGEHA PIRTÛKÊ LI KURDISTANA IRAQÊ**

***Di 11 Çirî 2009 de***, pêşangeha pirtûkê ya 30mîn li zanîngeha Salahaddînê, li Hewlêrê dest pê kir û ewê heta 15 Çirî bajo. Ew ji aliyê wezareta perwerdê, bi hevkariya rêxistina Huma, hatiye pêk anîn. 28 weşanxane û destgehên belavkirinê tê 15.000 berhem bi kurdî, erebî, farisî û ingilîzî pêşan dan.
*(pukmedia.com, mediakurd.com, 11.10.2009)*

***Di 16 Çirî de***, pêşangeheke din li bajarê Duhokê vebû. Nêzîkî 60 weşanxane beşdarî wê bûn û 60.000 berhem



www.avestakurdi.org

bi kurdî, erebî, ingilîzî û farisî tê de hatin pêşan dan. Ewê pêşangeheke din li bajarê Suleymaniyê bê vekirin.
*(pukmedia.com, 16.10.2009)*

**DU KONFÊRANS LI SEDSALIYA QANATÊ KURDO**
Bi hinceta sedsaliya bûna kurdologê navdar Qanatê Kurdo, du konfêrans hatin pêk anîn :

***15 Çirî 2009*** : li Duhokê, ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd.

***20 Çirî 2009*** : Li Diyarbekirê, ji aliyê rêxistina Çira.

Nivîskar û lêgerên ji perçeyên cihê yên Kurdistanê, Ewropa û Ostralya tê de li ser jiyan û berhema vî nivîskarê mezzin ê Kurdê Ermenistanê, ku riha (esl) wî ji Kurdistana Tirkiyê bû, peyivîn. Wî xwendina xwe li enstituya zimanên rojhilatî yên jîndar, li zanîngeha Lênîngradê, kutah kiri bû û gelek pirtûk li ser rêziman û wêjeya (edebiyat) kurdî nivîsî bûn.
*(pukmedia.com, 16.10.2009; kurdistan-news.com, 21.10.2009)*

**KEÇEKE PIÇÛK A KURD DI KOVARA FRANSÎ "ELLE" DE**
***Di Çirî 2009 de***, kovara jinan a fransî ya navdar « Elle » foto û gotarek li ser Medya Örmek weşad. Ev keçeke piçûk a 10 salî, ku fêrên zimanê kurdî li mala xwe, li Diyarbekirê, dide 27 zarokan e (li bultena me ya buhurî binêre).
*(avestakurd.net, rudaw.net, pukmedia.com, 17.10.2009)*

**KONFÊRANS LI SER LAÎKBÛNÊ LI KURDISTANA IRAQÊ**
***Di 17 Çirî 2009 de***, du konfêrans li ser laîkbûnê (sêkularîsm, cihêkirina dîn û dewlet), yek li Suleymaniyê û yek jî li Hewlêrê, bûn. A Suleymaniyê bi amadebûna Banû Hêro Ibrahîm Ehmed, xanima Celal Talabanî, serokê Iraqê, û jimareke mezzin ji ronakbîr û kesahiyên ramyarî (şexsiyyetên siyasî) bû.
*(pukmedia.com, aknews.com, 17.10.2009)*

**DÎTINA KEVNEŞOPÊN ANTÎK LI KURDISTANA TIRKIYÊ**
***Di Çirî 2009 de***, rûniştevanên Agirî, li Kurdistana Tirkiyê, di rêzekî de nivîseke şahê Urartu, ya 755-754 Berê Zayîna Îsa, dît.

Piştre, lêgerîn hatin kirin û doçent Dr. Rafet Çavuşoğlu got ku ew nivîseke mîxî ya şah Argiştî II ye. Wî tê de avakirina riyek û pirekê li ser çemê Arsiyanî (îro Murad) daxuyandi bû û xwesi bû ku ew li ser pirê bê daleqandin. Û wî tê de goti bû jî ku kesê ku vê "tablêt"ê têk bide (xerab bike) ewê ji aliyê Haldî, Xwedêyê bahozan, bê ceza kirin.
*(rizgari.org, 18.10.2009)*

Li Wanê jî, baweşankeke avzêrkirî ya Kakullî, jina şahê Urartu, Rûso II, hat dîtin. Li ser vê baweşankê hatiye nivîsîn : *"Ev tişt ê Banû Kakullî ye"*. Baweşank, tevî tiştên din ên dema Urartu, li muzeya bajarê Wanê hatiye pêşan dan.
*(rizgari.org, 24.10.2009)*

Li gundê Xirabreşkê, li nêzîkî Riha (Urfa), di dema lêgerînên arkêolojîk de, peykerekî 5,5 m., bi awayî "T", hat dîtin. Arkêolog û profêssorê zanîngeha Erdlangen, Prof. Dr. Klaus Schmidt, got ku ev peyker abîdeya herî kevn li cihanê ye.
*(avestakurd.net, 24.10.2009)*

**FÊSTIVALA SÎNEMA KURDÎ LI NEW YORKê**
***Ji 21 heta 25 Çirî 2009***, Fêstivala Filma Kurdî li New Yorkê bû. Ew ji aliyê 5 xwendekaran, ku ji wan 2 kurd û 3 amerîkî, hat pêk anîn. Jimareke mezzin ji fîlmên kurdî li ewyanên cihê yên vî bajarê amerîkî hatin nîşan dan.
*(avestakurd.net, 23.10.2009)*

**71 XWENDEKARÊN KURD ÊN IRAQÊ LI FRANSA**
***Di 25 Çirî 2009 de***, di merasîmekê de û bi amadebûna wezîrê perwerdeya bilind ê Kurdistana Iraqê û konsulê Fransa li Hewlêrê, 71 xwendekarên kurd ku ewê biçin Fransa ji bo ku tê de li zanîngehan bixwînin hatin pêşkêş kirin.
*(pukmedia.com, 25.10.2009)*

**MUZÎKA KURDÎ-BYÊLORÛSÎ LI MOSKO**
***Di Çirî 2009 de***, muzîkvanê kurd Masûd Talbanî û koma wî ya muzîka kurdî-byêlorûsî li klubekê li Mosko lîzt.

Masûd Talbanî, Kurdekî Iraqê, di salên 1990 de ji bo xwendinê çû bû Sint-Petersburgê (Léningrad). Piştî ku zimanê rûsî hîn bû, ew çû Byêlorûsya û tê de xwendina xwe li zanîngeha teknîkî kutah kir (qedand). Ew tê de weka muzîkvan hatiye nasîn û wî lîztina destgehên muzîka rojhilatî hînî gelek kesan kiriye. Nuha, ew bi pêkanîna projeyeke bi navê "Jazza Rojhilata Navîn", ku tê de saksofon û destgehên rojhilatî bi kar tîne, xerîk (mijûl) e.
*(avestakurd.net, 27.10.2009)*

**MUZÎKVANEKE KURD LI TÛNISÊ**
Li gora malpera entêrnêtê ya Tunis Info, stranbêja kurd Aynur Doğan ***di 27 Çirî 2009 de*** beşdar bû Fêstivala 4mîn a Tunisî ya Muzîkê. Beşdaran ew gelek hez kir, ji bo ku ev cara yekemîn e ku stranên kurdî li vê fêstivalê tên pêşkêş kirin.
*(aknews.com, avestakurd.net, 28.10.2009)*



www.arsivakurd.org

**PIRTÛKEK BI ALMANÎ**

Nivîskar û parêzera mafên jinan, Seyran Ateş, Kurdeke ku li Almanya dijî, pirtûkek bi almanî bi navê "Der Islam braucht eine sexuelle Revolution" (Pêwîstiya Islamê bi Şoreşeke Cinsî heye) nivîsî. Ew ji aliyê weşanxana Ullstein Verlage, Berlin 2009, hatiye weşandin. Nivîskar tê de ji gelek jinan pirs li ser cinayetên namûsê û keçbûnê dipirse.

*(netkurd.com, 29.10.2009)*

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE

Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.

www.arsivakurdi.org